



Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

BERAWIRDKIRINA FEQİYÊ TEYRAN
Û MELAYÊ BATEYÎ



BERAWIRDKIRINA FEQİYÊ TEYRAN Û MELAYÊ BATEYÎ

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ¹

Kurte

Em dixawzin di vê teblîxê deberawirdkirina jiyana Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî bikin. Em, di serî de kurtejiyana her du helbestvanan didin, paşê jî gelo di nav bera jiyana her du helbestvanan de manendî û cudahî çine û gelo Feqiyê Teyran bi jiyana xwe li ser Melayê Bateyî tesîr kiriye yan na, ger kiribe di kîjan aliyê de yan jî di kîjan aliyan de kiriye.

Feqiyê Teyran di sedsala 16 û 17an de jiyaye lê Melayê Bateyî di navbera sedsala 17 û 18an de jiyaye. Feqî, bi helbestvaniya xwe derdîkeve pêşberî me û Bateyî jî bi helbestên xwe lê bi taybetî bi mewluda xwe derdîkeve pêşberî me. Her du helbestvan jî mutesewwif in û bi bîr û baweriyên xwe li ser helbestvanên ku li dûv wan hatine tesîrek gelek mezin hêştine.

Em divê teblîxê de bi taybetî li ser vê pirsê sekinîne û me bersiva wî vekolandiye. Gelo Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî ji hin aliyan ve di bin bandora xwe de hiştiye yan na eger ne hiştibe di nav bera wan de manendî û cudahî hene yan na.

Peyvên Sereke: Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Berawirdkirin, Manendî, Cûdahî.

THE COMPARISON OF FEQİYÊ TEYRAN AND MELAYÊ BATEYÎ

Abstract

We would like to compare the lives of Feqiyê Teyran and Melayê Bateyî in this paper. We begin with presenting the short lifestories of both poets, and then focus on whether there are similarities and differences between their lives and whether there is any effect of Feqiyê Teyran on Melayê Bateyî in terms of his life or not, and if so then in what terms?

¹ Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü

Feqiyê Teyran lived in 16 and 17 centuries, however Melayê Bateyî lived between the mid 17 and 18 centuries. Feqî attracts attention with his poetric side, whereas Bateyî with his poems but particularly well-known with his “mawlid”. Both of the poets are sufistic and they had great influence on the poets after them.

We have especially highlighted this situation and investigated the answer. Did Feqiyê Teyran influenced Melayê Bateyî in some respects and if not what similarities and differences exist between them?

Key words: Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, ccomparison, similarity, difference

BERAWIRDKIRINA FEQIYÊ TEYRAN Û MELAYÊ BATEYÎ

1- Destpêk

Me xwest ku em bi vê teblîxa xwe li ser mijara berawirdkirina jiyana Feqiyên Teyran û Melayê Bateyî bisekinin. Pirsgirêka lêkolîna me ev e: Gelo Melayê Bateyî di bin bandora Feqiyên Teyran de maye yan na? Mabe ji kîjan aliyên ve maye, gava nemabe di navbera her du helbestkaran de çi hevparî, cudahî û manendî hene? Gava me van pirsan bersivandin em dê serwest bin ku hevbandoriya wan çêbûye yan na, yan jî ciyê wan ê di Wêjeya Klasîk de ka çi ye?

Di vê xebatê de çarçoveya berawirdkirinê hinek teng hatiye çixêz kirin. Di gotarê de hem ji aliyê jiyana wan ve hem ji aliyê dema perwerde û çanda edebî ve hatine berawirdkirin.

Di edebiyata berawirdkirî de kesên têne berawirdkirinê, ne pêwîst e ku ji heman neteweyê û ji çandê bin an jî berhemên ku dane, ne ji heman zimanê bin. Hetta jiyana du kesayetên ne hevdemê hevbin jî dibine mijara berawirdkirinê ev ji bo vî karî ne astengiyek e. Di berawirdkirinê de pêwîst e li ser du hunermendan were rawestandin. Ev her du hunermen ji aliyê ramanî ve werne lêkolînkirin û di navbera wan de çi hevparî, manendî û cudahî hebin pêwîst e were tespît kirin². Me jî di vê gotarê de ev rêbaz şopandiye û berawirdkirina jiyana herdu hunermendan xal bi xal nîşan

² Aytaç, Gürsel *Karşılaştırmalı Edebiyat*, Weş. Gündoğan, Enqere 1997, r. 7 (Yê ku ragihand: Yavuz Bayram)

da. Di berawirdkirin û bijartina mînanan de bi awayeke objektîf hatiye tavgerandin.

2- Jiyan Feqiyê Teyran

Yek ji helbestkarên ku di nav rupelên dîroka wêjeya Kurdî de ciyekî taybet digre Feqiyê Teyran e. Di derbarê zayîn û mirina Feqiyê Teyran de ji aliyê wêjenas û lêkolîneran ve gelek gotegot hatina nivîsîn; lê di derheqê dîroka jidayikbûna wî de agahiya bêguman di çarîneke xwe de bi gotina “Sal hizar û çil û yek çûn” re dîsa ew dide û bi vê risteyê em têdigihîjin ku Feqî 1563an hatiye dinê. Li ser dîroka mirina wî jî tu birhanên ber bi çav tunene; lê di helbesta xwe ya bi navê “Îro Werin” de dîrokekê dide û li gorî hesabê ebcêdê ew dîrok beramberê 1050yê koçiyê tê û ev jî 1640ê zayînî dike. Em dibînin ku Feqî heta vê dîrokê sax e û nêzîkî 80 saliya xwe dijî³. Li gorî van birhanan, ji lêkolînerên wêjeya Kurdî gelek ji wan dibêjin ku Feqiyê Teyran di navbera 1563 û herî kêr 1640î de jiyaye.

Li gorî gelek kesan (Qanatê Kurdo, Ebdurreqîb Yûsif, Feqî Huseyn Sagnîç, Mela Xalid Sadînî hwd.) Feqiyê Teyran li Muksê ji dayik bûye, lê li ser cihê ku tê veşartin gelek çîrok û metelok hatine gotin. Li gorî van çîrokan ew, yan li Muksê (gundê Werezûzê) yan jî li Hîzanê (gundê Şandîsê) hatiye veşartin⁴.

Navê wî yê rastî Mihamed e. Di hin helbestên xwe de navê xwe yê rastî bi kar anîye. Di dema berhevdana xwe û Melayê Cizîrî de di çarîneke xwe de “Bi ismê Muhemmed nav im.” dibêje û di derbarê vê mijarê de mînaka herî navdar dide.

Li gorî M. Xalid Sadînî û hin kesên din Feqî ji mala Mîrên Muksê ye û navê wî yê din di nava gel de tê zanîn “Feqê Mala Mîr Ebdalan” e. Sadînî di vir de, “Şerefname”yê ji xwe re bingeş digre û dibêje Feqiyê Teyran kurê Mîrê Muksê Mîr Ebdal e⁵. Ya bi rastî dema mirov Şerefnamêyê dinêre di dîroka navborî de di nav mîrên Muksiyan de bi navê Mîr Ebdalê kurê Mîr Ehmed heye û du zarokên Mîr Ebdal hene, navê yek ji

³ Sadînî, M. Xalid, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Helbest* û Berhemên Wî, Weş. Nûbihar, Çapa heftem, Stenbol 2013, r. 45.

⁴ Sagnîç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa yekem, Stenbol 2002, r. 370.

⁵ Sadînî, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Helbest* û Berhemên Wî, r. 47-50

wan jî Muhemmed e⁶; lê em teqez nizanin ku ev Mihemmed ka Feqî ye yan na. Û dîsa li gorî hin gotegotan Feqî ji gundê Şandîsê yê ku girêdayî Hîzanê ye, zewiciye.

Dema mirov jiyanê Feqî dişopîne dibîne ku ew li gorî siruştê xwe mîna derwêş û zanayekî jiyanê xwe geh li Muksê geh li Cizîrê û geh jî li Finikê derbas kiriye û ji ber vê yekê Feqî ji aliyê gel ve hatiye nasîn û hatiye hezkirin.

Ji behrem û helbestên wî em têdigihîjin ku Feqî di gelek medreseyan Kurdistanê de, nemaze li Mîksê di medreseya Mîr Hesênê Welî de, li medreseya Hîzanê, li medreseya Cizîra botan û li medreseya Finikê perwerdeyê baş dibîne; lê pîraniya helbestên xwe li Finikê dinivîse û li vir di derbarê jiyan û nivîsîna helbestên wî de gelek çîrok tên gotin û ev gotin di nava demê de li gelek cihan belav dibin û heta dema me dijîn⁷.

Em ji danberheva Feqî û Melayê Cizîrî dizanin ku Feqî û Mela hemdemê hevûdû ne û li gorî naveroka danberhava wan, di navbera wan de dostaniyek hebû, lewra Feqî pesnê Cizîrî dide. Li gorî Ebdurreqîb Yûsîf, dibe ku Melayê Cizîrî li bajarokê Cizîrê ders dabe Feqiyê Teyran jî⁸.

Berhemên wî yên ku tên zanîn evin: Dîwan, Zembîlfiroş, Şêxê Sennan, Keleha Didim û Bersîsê Abid.

3- Jiyana Melayê Bateyî

Melayê Bateyî, yek ji helbestkarên ê xwedî bi nav û deng e. Li ser jî dayîkbûn û mirina wî de gelek gengeşî hebin jî em ji lêkolînên li ser jiyana wî fam dikin ku kêma zêde di navbera 1675 û 1760î de⁹ jiyaye. Li gorî hin lêkolîneran ve ew hevdemê Ezdînşêrê çarem ê Mîrê Hekkariyê ye û liser têkiliya Bateyî û Mîr Ezdîn de jî hin çîrok hatine gotin. Li gorî Şerefnameyê Mîr Ezdîn 1696an de bûye Mîrê Hekkariyê¹⁰. Ev jî dîroka dayîkbûn û mirina Bateyî kêma zêde piştrast dike.

⁶ Şerefhan, *Şerefname Kürt Tarihi*, Wer. M.Emîn Bozarslan, Weş. Hasat, Çapa seyem, Stenbol 1990, r.245-246

⁷ Sagnîç, b.n.b, r. 371.

⁸ Ebdurreqîb Yûsîf, Şairên Klasîk ên Kurd, Weş. Dîwan, Çapa Yekem, Stenbol 2012, r. 39.

⁹ Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Çapa yekem, Stenbol 2013, r.245.

¹⁰ Sadînî, *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Helbest û Berhemên Wî*, Weş. Nûbihar, Çapa duyem, 2013, r.29

Li ser navê Bateyî yê rastî hin gengeşî çêbûne. Yekem carî Celadet A. Bedirxan 1941î de di kovara Hawarê de, navê Melayê Bateyî weke mele Ehmed nîşan daye; lê wî jî ev agahî ji A. Jaba girtiye¹¹. Piştî lêkolînerên weke Qanatê Kurdo, Feqî Huseyn Sağniç û Mehmed Uzun jî ev agahî di pirtukên xwe de ragihandine. Lê li gorî M. XalidSadinî, navê wî yê rastî Mela Huseyn Bateyî ye. Sadinî di vir de Hemaîla Bateyî ji xwe re kiriye referans û dibêje jixwe Bateyî Hemaîla xwe de navê xwe yê rastî weke Huseynê kurê Mistefa nivîsiye¹². Lêkolîner Ebdurreqîp Yûsif û Abdurrahman Adak jî di heman fikrî dene, jixwe di qada wêjeyê de jî êdî bi navê xwe yê rastî ciyê xwe girtiye.

Melayê Bateyî ji gundê Bateyê ye ku ev gund dikeve rojhilatê Elkê (Beytuşşebabê) û li gorî gelek kesan ew ji eşîra Ertûşîyan e. Navê bavê wî Mela Mustafa ye û Bateyî di nav malbateke oldar de jiyaye. Xwendina xwe ya pêşî li cem birayê xwe Mela Ehmed kiriye û piştî li gor Ebdurreqîp Yûsif, mîna feqeyên din ên Kurdistanê li Cizîrê di Medreseya Sor da, li Miksê di Medreseya Mîr Hesenê Welî de, li Finikê û Colemergê xwendiyê û bûye zanayekî zorbaş. Em ji helbestên wî tê digehişin ku ew ne tenê di qada ilmê dînî de, di wêjeyê de jî mirovekî jêhatî ye. Di helbestên xwe demijarên dîrokê, tesewifê, hedîsan hwd. gelek baş bikaraniye. Zimanê wî li gorî çanda wêjeya klasîk gelek zelal û hêsan e. Ew ji bilî Kurdî Farisî, Erebî û bi Tirkî gelek baş dizane.

Di derbarê jiyana wî de gelek çîrok û serborî hatine gotin, ev tê wê wateyê ku ew ji aliyê gel ve gelek hatiye hezkirin. Jixwe bi berhema xwe ya li ser ji dayikbûna Xoşewîst Pêxember (s.x.l.) hatiye nivîsîn ango bi mewlûdê di nava gel de bi rêzdarî û bi minetdarî tê bîranîn Berhemên wî yên ku tê zanîn evin: Mewlûd, Dîwan, Zembîlfiroş û Hemaîl.

4. Berawirdkirina Jiyana Feqiyê Teyran û Melayê Batêyî

4.1. Berawirdkirina Jiyana Wan

4.1.2. Feqiyê Teyran

- ✓ Navê wî yê rastî: Mihemmed e.
- ✓ Mexlasên wî: Feqiyê Teyran, Feqê Têra, Feqê Heşetê, Feqiyê

¹¹ Herekol, Azîzan: “, *Klasîkên Me An Şahîr û Edîbên Me Ên Kevin*”, Kovara Hawarê J. 33yan, Weş. Sebatê, Şam 1941, r. 9

¹² Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî, Jiyana, Helbest û Berhemên Wî*, r. 19.

- Gerok, Mîr Mihê, Meksî, Mîm û Hê, Mîm û Hê û Dal.
- ✓ 1563an de li gundê Werezûzê (Miksê) hatiye dinê.
 - ✓ 1640-41î de li gundê Werezûzê (Miksê) yan jî li gundê Şandîsê (Hîzanê) hatiye veşartin.
 - ✓ Di dema Mîr Ebdal de jiyaye.
 - ✓ Navê bavê wî Mîr Ebdal e û pîşeya bavê wî Mîrîtî ye. Li gor dîtîneke din navê bavê wî Ebdullah e û pîşeya bavê wî ne diyar e.
 - ✓ Wî pêşî li Miksê di medreseya Mîr Hesenê Welî de dest bi xwendinê kiriye û piştê li medreseya Xîzanê li medreseya Cizîra Botan û li medreseya Finikê perwerdehiyeke baş girtiye.
 - ✓ Feqîtfî kiriye. Jiyana xwe piranî li Finikê, Cizîra Botan û Miksê borandîye. Ew mîna derwêşekî jiyaye.
 - ✓ Bi helbestkarê navdar Melayê Cizîrî re berhevdanek çêkiriye.
 - ✓ Ew çîrok û serboriyên xwe ve di nava gel de hatiye hezkirin. Di çanda dengbêjiyê de dengbêjên ku çîrokên wî nizanibin tune ne.
 - ✓ Ew bi awayekî berbiçav di bin bandora Ferideddîn Attar de maye.
 - ✓ Ji helbest û berhemên wî tê famkirin ku ew jî bilî Kurdî bi Farsi, Erebî û Tirkî baş zanîbiye.

4.1.3. Melayê Bateyî

- ✓ Navê wî yê rastî: Huseyn e.
- ✓ Mexlasên wî Melayê Bateyî, Bateyî, Batê Hekkarî.
- ✓ 1675an de li gundê Batê (Elkê) hatiye dinê.
- ✓ 1760î de li gundê Batê (Elkê) hatiye veşartin.
- ✓ Di dema Mîr Êzdînê çarem de jiyaye.
- ✓ Navê bavê wî Mela Mustafa ye û pîşeya bavê wî Melatî ye.
- ✓ Wî xwendina xwe ya pêşî li cem birayê xwe Mela Ehmed kiriye. Piştê li Cizîrî li Medreseya Sor, li Miksê di Medreseya Mîr Hesenê Welî, li Finikê û Cölemêrgê perwerdehiyeke baş girtiye.
- ✓ Pîşeya wî melatî ye û bi qasî ku tê zanîn di medreseyan de dersdarî jî kiriye. Pêwendîya wî bi mîran re gelek baş bûye û bo vê yekê ew helbestkar û aqilmendekî mîran bûye.
- ✓ Berhevdaneke wî ya bi Mela Mensûrê Girgaşî re heye.
- ✓ Ew bi ihtimaleke mezin e ku dema Mewlûdê dinivîse di bin bandora Suleyman Çelebî de dimîne.
- ✓ Ew bi Mewlûda xwe ve di nava gel de bûye navdar û hê jî bi vê berhema xwe tê bîranîn.

- ✓ Ji helbest û berhemên wî tê famkirin ku ew ji bilî Kurdî, bi Farisî, Erebi û Tirkî jî baş dizane.

4.1.4. Manendiyên Wan

Weke ku tê dîtin her duyan jî di medreseyan Kurdistanê de perwerdeyeke baş a dînî û zanistî girtine. Îhtîmaleke mezin e ku bi xêra pîşeya bavên xwe xwendibin, lewra heta demeke nezîk jî bi gelemperî zarokên malên gewre yan jî zarokên seydayan dikaribûn perwerdeyeke baş bibînin. Em vê rewşê ji bo dema wan jî dikarin bifikirin. Feqî ji mala mîran bû, Bateyî jî di maleke ku mela û seyda (bav û birayên wî) tê de dijîn de mezin bûbû. Wan di heman medreseyan de perwerdeya xwe girtine, erdnîgariya ku piraniya jiyana xwe tê de derbas kirine herêma Serhed û Botan e. Em hem ji peyvên ku di helbestên xwe de bi kar anîne û hem jî ji berhemên ku dane tê digihijîn ku ew ji bilî Kurdî; di Farsî, di Erebi û di Tirkî de jî gelek pispor bûne. Her du jî xwedî berhem in, bi hevdemekî xwe re berhevdana wan heye û li gorî çanda edebî ya dema xwe tevgeriyane û di helbestên xwe de mexles bi kar anîne.

4.1.5. Cudahiyên Wan

Digel manendiyên helbestkaran bêguman cudahiyên wan jî hene. Ciyê ji dayikbûna wan ji aliyê erdnîgariyê ve her çend nêzîk bin jî lê ji hevûdû cihê ne. Feqî Miksê ji dayîk bûye, Bateyî jî li Elkê ji dayîk bûye. Feqî di qernên 16 u 17an de jiyaye lê Bateyî di navbera qernên 17 û 18an de jiyaye. Di navbera wan de kêmezêde sedsalek heye. Ji aliyê jimareyê ve mexlasên Feqî ji yên Bateyî zêdetir in. Li gor pirtûkên li ser jiyana wan hatine nivîsîn ji aliyê pîşeyê ve melatî û dersdariya Bateyî çêtir derdikeve pêş. Feqî nola derwaş yan jî feqiyan debara xwe kiriye, Bateyî di qesrên mîran de mîna zana û şêwirmendan hatiye pêşwazîkirin. Lê Feqî li gor sirûştê xwe di nava gel de maye û ji aliyê gel ve hatiye hezkirin. Bi qasî ku me tesbît kiriye Feqî dema Şêxê Sen'an nivîsiye di bin bandora Ferîdeddîn Ettarê Faris de maye. Bateyî jî dema mewlûda Kurmancî nivîsiye di bin bandora Suleyman Çelebiyê Tirk de maye. Feqî di nav zargotina Kurdiya Kurmancî de ciyekî qedirbilind girtiye¹³. Çîrokên wî bi riya dengbêjan belav bûne û bi vî awayî di nava gel de bûye navdar. Lê Bateyî bi Mewlûdnemeya xwe ya pîroz di nava edebiyata dînî de ciyê xwe girtiye û bi rêzdarî hatiye bîranîn.

¹³ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, B. 2. Weş. Aram, Çapa 3., Amed, 2013, r. 60-88.

4.2. Berawirdkirina Wan ya ji Aliyê Dem û Çanda Edebî ve

Di dema Feqî û Bateyî de di nav sînoren dewleta Osmaniyan de ji hêla çanda wêjeyî ve çî qewimiye û çêja edebî hatiye jiyandin pêwîst e li ber çavan were raxistin. Sedsala 16. û 17. ji bo dîroka wêjeya Kurdiya Kurmancî mîna sedsalên zêrîn tîrîn pêjirandin¹⁴. Ev bilindbûn di sedsala hijdehem de jî dewam kiriye. Di navbera sedsalên 16 û 18an de Ehmedê Xanî destaneke netewî ya Kurdî ango Memê Alan ji xwe re kiriye bîngeh û şahesera xwe ya bi navê Mem û Zîn nivîsiye. Di Kurdiya Kurmancî de li gorî rêbaza mesnewiyê yekem car e ev cûreberhem hatiye nivîsin. Piştrê Selîmê Silêman Yûsuf û Zuleyxayê, Harisê Bitlîsê Leyla û Mecnûn nivîsiye. Di warê ferhengnivîsînê de Nûbihara Biçûkan ya Xanî û Gulzara Îsmailê Bazîdî li ber çavan dikeve. Dîsa Cizîrî li gorî rê û rêbaza dîwanê, dîwana xwe nivîsiye. Ji bilî van Eliyê Teremaxî di nava wêjeya Kurdiya Kurmancî de yekem car serfa Kurmancî nivîsiye û jixwe di warê xezelê de hostayekî weke Cizîrî, di warê mesnewiyê de lûtkeyeke weke Xanî jiyaye... hwd. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku di navbera van sedsalan de di derbarê wêjeya Kurdî ya klasîk de berhemên cihêreng û yê nû hatine dayîn.

Mîrov nikare wêjeya Kurdî ya klasîk ji edebiyata Osmanî ya klasîk dûr bigire. Lewra di van sedsalan de Kurdan jî di nav sînoren dewleta Osmaniyan de dijîn û weke parçeyekî Osmaniyan di hatin hesabandin. Ji ber vê yekê ji aliyê çêja wêjeyî ve têhma xwe dabine hevûdû jî tiştêkî xwezayî ye; jixwe neteweyên ku di nav sînoren Osmaniyan de dijîn ji aliyê çand, huner û wêjeyê ve jî bandorî li hev kirine.

Di van sedsalên navborî de tekye û medreseyên Osmaniyan de jî gelek helbestkar, alim û mutesewif gihîştine¹⁵. Helbestkarên klasîk ên ku bi çanda Îslamê re perwerde dibûn di helbestên xwe de bi jimareyeke zêde peyvên Erebi û Farisî bi kar tanîn. Ev rewş weke hunerekî ji aliyên wan ve dihate dîtin û bi vê yekê şanaz dibûn; lê piştî demekê bizaveke nû ya bi navê “Tirkiya hêsan” (Turkî-î Basît) ji aliyê Tatavralî Mahremî û Edîrnelî Nîzamî ve derdikeve pêş¹⁶. Ew jî li gorî bizava xwe di helbestên xwe yê Tirkî de heta ji destê wan dihat cî nedidan peyvên Erebi û Farisî. Helbestkarên ku di vî fikrê de bûn di xwestin ku cî bidine peyvên Tirkî û peyvên

¹⁴ Adak, b. n. b., r. 185-186.

¹⁵ Mengî, Mîne, *Eskî Turk Edebiyatı Tarihi*, Weş. Akçag, Çapa 6., Enqere 2000. r. 152.

¹⁶ Mengî, b. n. b., r. 153.

rojane. Ev rewş heta demekî berdewam kiriye.

Bizava Tirkîya hêsan sedsala 18an de bi navê “Bizava Heremî-bûnê” (Mahallîleşme Akimi) derdikeve pêşberî me. Di vê mijarê de jî Nedîm bûye lûtke. Destpêka vê serdemê de helbestkarê Îranê bala helbestkarên Tirk êdî nedikişandin. Helbestkarên Tirk ji peyvê Farisî têr bûbûn û dixwestin ku çêja gel a wêjeyî bi zimanekî xwemalî vebêjin û pewîst bû ku di vê vegotinê de ne peyvên Erebi û ne jî yên Farisî; lê peyvên gelerî hebûna. Lê sedema heremîbûnê ne ev tenê bû. Li gorî Banarî şerê Îraniyan û Osmaniyan jî kiribû ku ji çêja wêje û çanda Ecemî dûr bikevin¹⁷. Di van serdeman de helbestkarên mîna Nedîm û Şeyh Galib ji bilî kêşa erûzê kêşa kîteyî jî bi kar anîne. Helbestkarên wê demê xezel û mesnewiyên xwe de zimanekî hêsan de bi kar anîne û di mesnewiyên xwe de li şûna çîrokên edebiyata Farisî cî dane çîrokên xwemalî û dîsa jiyana rasteqînî bûye mijara menzûmeyên wan.

Manendî û cudahiyên wan ên ji aliyê dem û çanda edebî ve di çarçoveya nivîsa jorê de dikare were berawirdkirin.

4.2.1. Manendiyên Wan:

Dema em li helbestên her duyan dinêrin hevbeşiya wan a balkêş zimanê helbestên wan e. Şêwaza helbestên/menzûmeyên wan li gorî çand û çêja wêjeyî ya wê demê hatiye bikaranîn. Çawa ku helbestkarên di nav sînorên Osmaniyan de dijîn di bin bandora bizava heremîbûnê de dimînin û di rîya vê bizavê de helbestên ku şêwaza wan hêsan be dinivîsin û ew jî bi heman celebê helbestan dinivîsin. Ji bo ku şêwaza helbestên wan gelek hêsan e, helbestên wan bê ferhengên Farisî û Erebi jî têne famkirin.

Di vê demê de çawa ku hin helbestkar berê xwe ji edebiyata Farisan badane ber bi xwe ve, di şûna çîrokên Farisî de cî dane çîrokên xwemalî, Feqî û Bateyî jî heman helwestî nîşan dane û her du jî Zembîlfiroş nivîsîne em dizanin ku destana Zembîlfiroş ji aliyê mijarê ve xwemalî ye ango Kurdewar e. Ev her du Zembîlfiroş jî bi zimanekî hêsan hatine nivîsin.

Di navbera sedsala 16 û 18an de gelek berhemên qedirbilind hatine dayîn. Çawa ku di van serdeman de yekem car e dîwan û mesnewiyên

¹⁷ Banarî, Nihat Samî, *Resmîlî Turk Edebiyatı Tarihi*, B. 2. Weş. MEB., Çapa ?, Stenbol 2001. r. 745.

bi rêk û pêk hatine nivîsîn û dîsa çawa ku yekem car e ferheng û serfa Kurmancî hatine nivîsîn, Feqî û Bateyî jî berhemên ne kêmtir van nivîsîne. Feqiyê Teyran di dîroka wêjeya Kurdiya Kurmancî de yekemîn helbestvanê di derbarê çîrok û serpêhatiyên jiyana tesewîfî de menzûme nivîsîne û dîsa Bateyî jî di wêjeya Kurdî ya dînî de yekemîn mewlûda Kurmancî nivîsiye¹⁸. Heta Bateyî zimanê mewlûdê di nav Kurdan de Erebbî bû. Ji bilî van jî ew li gor atmosfera wêjeyî ya dema xwe tevgeriyane û di menzûmeyên xwe de hem kêşî erûzê û hem jî ya kêteyî bi kar anîne. Bi van mînan em dibînin ku ne Feqî û ne jî Bateyî ne kêmtir çêj û çanda wêjeyî ya dema xwe ne. Û ji guherînên çêj û çanda wêjeyî ya cîranan jî dûr nemane. Ango ji bizava heremîbûnê para xwe girtine.

4.2.2. Cudahiyên Wan:

Di vê demê de ji ber bizava heremîbûnê Feqî û Bateyî her çî qas destana Zembilfiroş nivîsîbin jî lê belê Feqiyê Teyran berhemên mijara tesewîfê vedihewîne jî nivîsiye: Bersîsê Abid û Şêxê Sen'an ji van berhemên in. Feqî dema van çîrokan tesewîfê dihûnîne ji wêjeya Erebbî û Farisî sûdê werdigire. Lê di nav berhemên ku Bateyî dane de tu gewşîneke wisa tune ye.

Di nav bastana/kevneşopiya wêjeya klasîk de heta dema bizava heremîbûnê cîyê jiyana rasteqînî di nav helbestan de tune bû û wêjegerên klasîk tu caran cî nedidan nav û gewşînên rastî yê hezkiriyên xwe; lê Bateyî li gor atmosfera dema xwe çûye û di murebba xwe ya bi navê “Ji Eltafa Şehîşanê” de behsa keça xwe ya bi navê “Asmîn”ê kiriye:

*Ji asmîn û terazîm bû
Bi naz û îşwe mazin bû
Xirêna toq û bazin bû
Gohar şor bûn li ser sîne*¹⁹

Û dîsa murebbeyeke xwe ya din a bi navê “Ji Bextê Min Reşî Rabû” de behsa daweta xwe kiriye û di çarîna dawiyê de jî navê xanima wî Hemail raste rast derbas dibe. Ev şopên jiyana rasteqînî ne li gor sirûştî wêjeya klasîk e; lê Bateyî jî bo ku di bin bandora heremîbûnê de maye ji jiyana

¹⁸ Adak, b.n.b. r. 214.

¹⁹ Sadî, *Mela Huseynê Bateyî, Jîyan, Helbest û Berhemên Wî*, b.n.b., r. 31-32.

têgehên razber ên wêjeya klasîk dûr ketiye; lê bi qasî ku me tespît kiriye di menzûmeyên Feqî de tu şopên jiyana rasteqînî tune ne. Hebin jî ne bi qasî Bateyî rast û rast nehatine bi kar anîn.

5. ENCAM

Em, serencama berawirdkirina Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî û bi teybetî cudahî û manendiyên helbestên di dîwanên wan de dikarin di bin çend xalan de bicivînin:

Manendiyên jiyana wan, ji aliyê erdnîgariya ku jiyana xwe li serê dewam kirine, medreseyên ku perwerdeya xwe jê girtine û ji aliyê zimanê ku dizanin ve nîzîkî hev dibin; lê ji aliyê dema ku jiyane, ji aliyê pîşe û kesên ku di bin bandora wan de mane de ji hevûdû cuda dibin.

Manendiyên wan ên ji aliyê dem û çanda edebî ve zêdeyî cudahiyên wan in. Her du jî ji aliyê çawaniyê ve berhemên ne kêmtî dema xwe dane. Dîsa helbest û menzûmeyên xwe li gor çand û çêja edebî ya dema xwe nivîsîne; ango di bin edebiyata gelerî/heremîbûnê de mane û di vê riyê de zimanekî hêsan bi kar anîne.

Manendiyên wan ên ji aliyê berhemên ku dayîn ve li gor cudahiyên wan kêmtî dimînin. Lê di berawirdkirina dîwanên wan de manendiyên wan ên ji aliyê teşe û jimareya helbestên wan de zêdetir dibin. Ya balkeş ew e ku di dîwanên wan de jimareya çarînan/murebbayan serdest e.

Ji aliyê şêwazê ve cudahiyên wan hebin jî, lê manendiyên wan zêdetirin. Bateyî li gor Feqî di helbestên xwe de zêdetir cî daye peyvên Erebi; lê belê ji bo ku her du jî di bin bastana salata edebî ya dema xwe de mane zimanekî xwerû bi kar anîne.

Nirxandina dawî, di vê xebatê de tu tesîra Feqiyê Teyran a li ser Melayê Bateyî nehatiye tespîtkirin; lê manendiyên wan gelek in. Bi teybetî ev agahî ji bo manendiyên wan ên ji aliyê ” teşe ” û ” şêwazê “ ve dikare were gotin. Sedema vê jî di binbandormayîna çand û çêja edebî ya dema xwe ne, ango bizava heremîbûnê û çêja edebiyata gelerî ye.

Di çarçoveya agahiyên di vê xebatê de dikare werin gotin ku her du helbestkar jî ji bo ku helbestên xwe bi şêwazeke xwerû nivîsîne û di helbestên xwe de bi giranî çarînan bi kar anîne û dîsa hin helbest û menzûmeyên xwe li gor keşa kîteyî honandine ew, bi aliyekî xwe ve nêzîkî edebiyata gelerî bûne. Em ji şêwaz, teşe û helbest û berhemên Feqiyê Teyran serwest dibin ku ew, di navbera edebiyata gelerî û ya klasîk de mîna pirekî ye û bi vî awayî ciyê xwe di dîroka edebiyata Kurdî de girtiye. Melayê Bateyî jî li gor Feqiyê Teyran ji bo ku keşa erûzê baştir û hin peyvên Erebbî zaftir bikaraniye û dîsa helbestên dînî weke “naet, munecat û tewhîd”ê li gor Feqiyê Teyran bi jimareyeke gelectir xebitandiye ew, li gor Feqiyê Teyran baştir nîzîkî edebiyata Kurdî ya klasîk bûye.

Çavkanî

Adak, Abdurrahman, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weş. Nûbihar, Stenbol 2013

Aytaç, Gürsel, Karşılaştırmalı Edebiyat, Weş. Gündoğan, Enqere 1997

Azîzan, Herekol, Klasîkên Me An Şahîr û Edîbên Me Ên Kevin, Şam 1941

Banarlı, Nihat Sami, Resimli Tütk Edebiyatı Tarihi, MEB, Stenbol 2001

Celîl, Ordîxanê, Zargotina Kurda, Weş. Aram, Amed 2013

Kurt Kahramanlık Destani, Dimdim(Wer., Îbrahîm Kale), Weş. Avesta, Stenbol 2001

Cihanî, Perwîz, Mem û Zîn, Weş. Nûbihar, Stenbol 2010

Develioğlu, Ferit, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Weş Aydın Kitevi, Enqere 2001

Dilçin, Cem, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, Weş. TDK, Enqere 2004

Demîrhan, Umîd, Ferhenga Destî, kurdî bi kurdî, Weş. Nûbihar, Stenbol 2006

Farqînî, Zana, Ferhenga kurdî-tirkî, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004

- Me‘rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weş., Aras, I-VII. Hewlêr, (2010)
- Malmîsanij, M., Ji bo rastnivîsînê Ferhenga Kurdî(Kurmancî)-Tirkî, Weş. Rûpel, Stenbol 2012
- Mengi, Mine, Eski Türk Edebiyatı Tarihi, Weş. Akçağ, Enqere 2000
- Îzolî, D, Ferhenga kurdî-tirkî, tirkî- kurdî , Weş., Deng, Stenbol 2013
- Qanatê Kurdo, Tarixa Edebyeta Kurdi, Weş. Öz-Ge, Enqere 1992
- Levend, Agah Sırrı, Divan Edebiyatı, Kelimeler ve Remizler-Mazmunlar ve Mefhumlar, Weş. Enderun, Stenbol 1984
- Pala, İskender, Divan Edebiyatı, Weş. Ötüken, Stenbol 1998
- Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, Weş. Kapı, Stenbol 2004
- Sadînî, M. Xalid: Feqiyê Teyran, Jiyan, Helbest û Berhemên Wî, Weş. Nûbihar, Stenbol 2013
- Mela Huseynê Bateyî, Jiyan, Helbest û Berhemên Wî, Weş. Nûbihar, Stenbol 2011
- Sagniç, Feqî Huseyn, Dîroka Wêjeya Kurdî, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002,
- Saraç, Yekta M. A., Klasik Edebiyat Bilgisi, Weş. Gökkuş, Stenbol 2010
- Şemrexî, Huseyn, Mewlûd, Melayê Bateyî, Weş. Nûbihar, Stenbol 2012
- Şerefexan, Şerefname Kürt Tarihi (Wer.: M. Emin Bozarslan), Weş. Hasat, Stenbol 1990
- Yûsif, Ebdurreqîb, Dîwana Kurmancî, Şaîrên Klasîk ên Kurd, Weş. Dîwan, Stenbol 2012
- <http://www.ehlisunnetbuyukleri.com/Islam-Alimleri-Ansiklopedisi/De-tay/MUHAMMED-BIN-MUHAMMED-EL-MUSULI/2774>
- <http://samil.ihya.org/ansiklopedi/anasir-i-erbaa.html>
- http://perweb.firat.edu.tr/personel/yayinlar/fua_120/120_85864.do

